

DI DEMA PÊKHATINA TUNDIYÊ DE HÛN DİKARİN GILIYÊ XWE PÊ DE BIKIN SAZÎ Û DEZGEHÊN

- Walîti
- Qeymaqamî
- Miqamên dadî (serdozgeriya komarê û Dadgehên malbatê)
- Birêveberiyên bajêr ên wezerata malbat û civakî)
- Navendên pêşîlêgirtin û şopandina tundiye
- Saziyên tendûristiyê
- ALO 183, Xeta şewrê ya xizmeta civakî bo malbatê jinê û zarok û astengdaran
- ALO 155 hawariya asayîşe
- ALO 16 hawariya cendirma
- Birêvebiriye xizmeta civakî yê bajêr
- Navendên şewirmendiyê yê jinan a şarederiyên
- Navendên şewirmendiya jinê yê baroyan û saziyên dadî yê alîkariyê
- Dezgeyên sîvîl ên civakiyên jinan
- Pêkanîna KADES ê
- Komelaya şewirmendiya ligel koçber û penaberan

Mor Salkim Kadın Dayanışma Derneği

Xeta telefonê a tundiye 7/24

0531 033 88 44

Instagram: morsalkimkadin Facebook: morsalkimdernegi Twitter: MorMorsalk

Email: morsalkimdernegi@hotmail.com

Website: www.morsalkim.org.tr

EKAMEDER

Xeta telefonê a tundiye

0552 591 0 183

Instagram: ekameder

Mimoza Kadın Derneği

Xeta telefonê a tundiye

0324 237 37 36

0552 753 70 33

Instagram: Mimoszakadin Twitter: mimoszakadin

Star Kadın Derneği

Xeta telefonê a tundiye

0432 216 66 61

Instagram: Star_kadn

Türk Anneler Derneği

Trabzon Şubesi

Facebook: TrabzonTurkAnnelerDernegi

Trabzon Kadın Yaşam

Merkezi Derneği

Instagram: yas.kadmer



Ji Edirne heta Wanê

EM TUNDIYÊ RADIWESTÎNIN



PLANA MÎSOGERA XWEPARASTÎNA JI TUNDIYÊ

•Xwe dûr bikin ji cihên wek metbex û serşokê ku alavên birra û kûnker lê hene,herwiha ji deverên ku mimkûn e lingê we bişemite dûr bisekinin. Li deverên ku derfeta tevgerê dide we biminin. Di dema tundiyê de nekevin cihên wek metbex û serşokê û derî bi ser xwe de negirin,heta ji we tê xwe bidin aliyê deriyê derve .



•Di dema tundiyê de bi dengê bilind biqîrin . Wiha hûn dikarin alîkariyê bidest bixin û cîranên we dikarin ji we re şahidiyê bikin.

•Heger fikarek we ya ku hûn rastê tundiya fîzîkî bîn hebe, hûn dikarin vê yekê bi cîranekî/ê xwe re parve bikin. Di demê ku hûn hewceyî alîkariyê ne de, bi şanîdarek ku weberî wextan diyarkirîbû hûn dikarin wî/wê cîranê xwe agahdar bikin. Wê demê cîranê we dikare bangî polês bike. (Li gor zagonên me hemû kes dikarin giliya bûyerên tundiyê bikin,dema ku gilî dikin ne mecbûrin ku nav û nîşanên xwe bêjin.)



•Pêkanîna KADES ê (kadîna destek uygulaması/ pêkanîna piştgiriya jînê)daxînin telefona xwe. Di dema tundiyê de dê giliya we rasterast bigihêje ewlekariyê û hûnê bikaribin alîkariyê werbigirin.

•Nimroyên telefonê yên ku hûn dikarin xwe bigihîninê û piştgiriya wergirin hilînin ber xwe ,an jî wan nimrayan bi awayekî qeyd bikin ku hûn bikaribin bi tûşekê lêgerîne bikin.



•Ji bo zarokên xwe bi ewle diyar bikin. (odeyek ku tê asêkirin,mala cîranekî/ê we). Ji zarokên xwe re bibêjin ku “peywira te ew e ku tu di dema ewlehîyê de bî,ne ku tu min

biparêzî.”

•Ji bo xwe tûreke rewşa lezgîn amade bikin û daynîn ciheke wisa ku hûn bi hêsaniyê bigihîjinê. Vî tûrikî li cem hevalekî/ê xwe an jî li cem cîranekî/ê xwe ye ku hûn pê ewle ne veşêrin. Hûn dikarin wan tiştên xwe bikin tûrî. Nasnameya we û yên zarokên xwe ,ehliyeta ajovaniyê ,belgeya zayînê an jî belgeyên wek pasaportê (an fotokopiyên wan belgeyan). Heger hûn biyanî bin û heger hebe destûrnameya xebatê û ya rûniştinê . Hinek pere û qerta qrediyê . Belgeyên SGK yê an jî belgeyên sigorteya tendurîstiya taybet. Heger hebe dermanên we an jî an zarokên we daimî. Cil û bergên we û yên zarokên we . Alavên we yên giranbiha yên ku we kengî xwastiye hûn bikaribin bifroşin. Hema belgeyek ku ji dadgehê hatiye wergirtin ,an jî biryarnamêyê tedbîrê, li ser we qeydkirî nebe jî belgeyên di derbarê milkên heylî de (tapûya erd, xênî ,rûhsata wesayîte)an jî kopyayek peymanî kirê, mifteyêk mayî ya malê an jî wesayîte ,şarja telefonê



• Heger we biryara derketina ji malê dabe, di demê herî bi ewle de derkevin . Saet di çî de ,hûnê di kîjan deriyê an jî şibakeyê de derkevin , pişt re hûnê gaweke çawa biavêjin baş ser û ber bikin

PÊVAJOYÊN ZAGONÎ BO ŞOPANDINA PÊKHATINA TUNDIYÊ

Peymana Stenbolê bi benda xwe ya 6285, ku tê wateya parastina malbatê û pêşîlêgirtina tundiya li ser jinê, li hember tundiyê li ser qanûneke misoger e. Di jêrî zagonan de hûn dikarin piştgiriya li jêr werbigirin.

Hûn tûşî kîjan cûre tundiyê werin jî hûn dikarin serî li qeraqolê an jî li dozgeriyê bidin. Peywirdarê qeraqolê lêkolînê dikin û

sûcê heylî ser û ber dikin û belgeyan radigihînin dozgeriyê. Her wiha heger tundî bête destnîşankirin beyî lêpîrsina gilîkirinê ,ji bo biryara parastinê dosye ji bo dadgeha malbatê tê vekirin.

Dozger bi sedan delîlên berhevkerî dikare biryara doza cezayê werbigire. Heger hûn rastê tundiya fîzîkî hatibin, ji bo destnîşankirina tundiyê teqez “rapora derblêdanê” wergirin.

Di jêrî qanûna parastina malbatê û pêşîlêgirtina tundiya li ser jinê ya bi benda 6282, bêylî ku hûn xerciyekê bidin û bi lezgîniyê hûn dikarin daxwaza bidûrxistinê û parastinê bikin.

Dadgeha malbatê biryara xwe ya di derbarê parastinê de radigihîne kesê tundiyê pêkaniye. Yê ku tundî pêkaniye, heger li dijî biryara parastinê tevbigere ,di derbarê wî de doza cezayê tê vekirin û ew kes dikare bê girtin.

Heger rewşa we ya aborî ne guncav be, baro dikare bi xizmeta xwe ya “alîkariya dadgehî “alîkariya we bike bêylî ku tu xerc ji we wergire.

Hûn dikarin serî li navenda pêşîlêgirtinê û şopandina tundî ya li bajarê xwe bidin û di mala starê de bi cih bibin.

Ji bilî bajarê xwe hûn dikarin daxwaza çûyîna mala starê ya bajarekî din jî bikin. Lê heger zarokên we hebin û zarokên we yê lawîn ên bi ser 12 salî ve bo mala starê nayên wergirtin. Ji bo demêkê kurt ew dikarin di bin ewlekariya dewletê de li saniyeke dîtir bisitirin.

